

Programa Vaksîna Swêdî

Ji bo Keçikan Vaksîna Li dijî HPV

I-ê meha çilaye paşîn li gor programa vaksînê, ji bo zarokan dest bi vaksîneke nuh tê kirin. Ev vaksîn li dijî wê vîrusê ye ya ku dikare bibe sebebê kansera malzarokan (Livmoderhalscancer). Û ji bo hemû keçikên sala 1999 û yan piştî hingê bûne, tê dayîn. Keçik gava sinîfa 5-ê, yan 6-ê ne, li ba hemşîreya dibistana tên vaksîn kirin.

Ji bo dayîk û bavan

Vaksîna nuh nêzîkî li dijî %70 ya hemû çêşîdên kansera malzarokê (livmoderhalscancer) keçikan diparêze. Yanî eger meriv xwe vaksîn kiribe jî, rîsk heye ku dîsa jî nexweş bikeve. Loma pir muhîm e ku meriv salên piştî vaksînê jî bi nîzam li ba jînekologan here kontrola hucreyan. Keçikên ku di temenê ciwanîyê de xwe vaksîn dikin û paşê di temenê mezinîyê de derin kontrola hucreyan dikin, dikarin pir baê xwe li dijî kansera malzarokan biparêzin.

Berî ku tu qerara vaksîn kirina zaroka xwe bidî, belkî hin pirsên te hebin. Vaksînek çawa dikare meriv ji kanserê biparêze? Vaksîn çawa tê kirin? Li vi rem bersiva pirsên te didin.

Vaksînek çawa dikare meriv ji kanserê biparêze?

Navê vîrusa ku dibe sebebê kanserê humana papillomvirus (HPV) e. Ev vîrus bi riya kontakta cinsî dikeve laş. Û piranîya keçikan di dirêjîya jîyana xwe de carna rastî vê vîrusê tên. Enfeksiyon gelek cara ne xuya ye û xwe bi xwe sax dibe.

Lê enfeksiyon li ba beşekî biçûk ji keçikên ku ev vîrus vegirtine, wextekî pir dirêj dimîne. Hingê rîsk heye ku hucreyên malzarokê bîn guhertin. Eger ew hucreyên guhertî di wextê xwe de neyên dîtîn û avêtin, dikarin bibin sebebê kanserê.

Bi sedan çêşîdên cihê yê vîrusê hene û 14 ji wan dikarin bibin sebebê kanserê. Vaksîna me li dijî 2 çêşîdên vîrusê ne yê ku ji gişan zêdetir nexweşîyê peyda dikin. Di pratîkê de vaksîna me dikare li dijî nêzîkî %70 ya giş kanserên malzarokan keçikan biparêze.

Vaksîn dikare li dijî nexweşîyê biparêze, bi tenê eger heta hingê yekê ew vîrus venegirtibe. Loma jî pir muhîm e ku berî cara pêşî ya kontakta cinsî yan dîrek piştî wê divê vaksîn bê kirin.

Li dijî kansera makzarokê vaksîn û kontrola hucreyan hev temam dikin.

Bi saya serê programa vaksîna swêdî, îro awayekî bitesîr heye ku meriv li dijî kansera malzarokê xwe biparêze. Li gor programê giş jinên di navbera 23 û 60 salî de dikarin binîzam herin kontrola hucreyan. Kontrol hêsan û bê êş e. Armanç dîtina guhertinên hucreyan e berî ku ew bibin sebebê kanserê. Ji salên 1960-an û vir de ev program heye û mirina ji ber kansera malzarokê pir kêmtir kiriye.

Pir muhîm e ku keçikên xwe vaksîn kirine, her tim herin kontrola hucreyan jî bikin, ji bona ku li dijî %30 çêşîdên din yê kanserê bê parastin in.

Keçikên ku xwe vaksîn dikin û paşê jî bi nîzam derin kontrola hucreyan dikarin parastina xwe ya li dijî nexweşîyê qayîmtir bikin. Tê hesab kirin ku vaksîn û kontrola hucreyan bi hev re dikarin li Swêdê gelek jinan ji mirinê xilas bikin.

Vaksîn çawa tê kirin?

Hemşîreya dibistanê keçikan vaksîn dike. Vaksîn ji aliyê derva yê çeng tê şerenqe kirin. Ji bona ku tesîra vaksînê baş be, di navbera 5 û 7 mehan de divê çîkek 3 cara bê şerenqe kirin.

Kijan paştesîrên vaksînê hene?

Li ba piranîya keçikan paştesîr peyda nabin. Hin paştesîr ji yê din zêdetir peyda dibin, ew jî cihê şerenqê sor dibe, piçekî diwerime û hessas dibe. Li ba hin keçikan dilxelîn, vereşîn û îshal peyda dibe. Li ba hinan jî serêş, hesasîya masulkan (ömma muskler) yan westîyan peyda dibe.

Paştesîrên kêmtir peyda dibin jî ev in: Gêj bûn, enfeksiyona qirikê, hişkbûna ciyê şerenqê yan tevîzîna der û dora ciyê şerenqê.

Faktayên li ser kansera malzarokê

Temenê navencî (medelâlder) yê jinên swêdî ku kansera malzarokê bi wan re çêdibe sala 54-ê ye. Piranîya wan berî 20 salîya xwe vîrusa HPV vegir-tine. Enfeksiyona vîrusê gelek salan weha dewam kiriye ta ku hucreyên malzarokê guherîne. Û paşê jî ev guherîn bûne sebebê kanserê.

Kanserê malzarokê nexweşîyeke ciddî ye. Li giş dinyayê her sal nêzîkî 250.000 jin ji ber vê nexweşîyê dimrin. Li Swêdê her sal nêzîkî 450 jin pê dikevin û terîben 150 ji wan dimrin. Statîstîkên li ser kansera malzarokê xuya dikin bê bi nîzam kontrola hucreyan çiqas muhîm e. Ji her 10 jinan 8 jinên ku kansera malzarokê ya ciddî bi wan re peyda dibe, yan qet neçûne kontrola hucreyan, yan jî xemsarî kirine.

Pirsên pir tîn kirin

Keçikên ku vaksîn girtine bi temamî êdî bi kansera malzarokê nakevin?

Na. Dikarin bikevin. Vaksîn li dijî teqrîben %70 ya çêşîdên kansera malzarokê ye.

Madem vaksîn heye êdî kontrola hucreyên malzarokê ne lazim in?

Belê, sedî sed lazim in. Ji ber ku keçikên vaksîn kirî li dijî %30 ya çêşîdên din yê kanserê bê parastin in. Loma pir û pir muhîm e ku keçikên xwe vaksîn kirine jî herin kontrola hucreyan bikin. Ev kontrol ji 23 salî û pê de tîn kirin.

Ma vaksîn lazim e eger awayekî din yê xuya kirina guherînên hucreyan hebe?

Lêkolîn xuya dikin ku vaksîn û kontrola hucreyan bi hev ra xwe ji nexweşîyê parastinê qayîmtir dikin. Û ev yek jî gelek jinan ji mirinê xilas dike.

Gelo paşê dîsa vaksîn lazim e?

Hîn em nizanin. Û em nizani eger lazim be, keçik careke din kengî bîn vaksîn kirin. Loma Komî- teya Serkar ya Karên Sosyal (Socialstyrelsen) wê bi diqatbala xwe bide lêkolînên li ser parastina bi vaksînan, ji bona ku em bizanin vaksîn çiqas wext jinan diparêze.

Çima vaksîna HPV bi tenê jib o keçikan e?

Ji ber ku bi tenê jin bi kansera malzarokê dike- vin. Loma heta niha me bala xwe daye ser tesîra bi vaksînê parastina keçikan. Lêkolîn tîn kirin, ji bona kub ê zanîn heta kîjan derecê ev vaksîn dikare lawikan li dijî çêşîdên din yê kanserê biparêze.

Dixwazî zêdetir bizanî?

Di destê pêşî de here ba Lê Mêzekirina Tenduristîyê ya Dibistanan (Skolhälsovården).

GİRİNG!

Berî vaksîn kirinê – Eger allerjîya zaroka te hebe, yan paştesîrên nenormal yê vaksînên berê hebûne, berî vaksîna keça xwe, ji bo hemşîre bêje.

Piştî vaksîn kirinê – Eger te tiştêkî ne normal li ba zaroka xwe dît, têkilî bi Lê Mêzekirina Tenduristîyê ya Dibistanan (Skolhälsovården) re deyne.